Welat
01/10/2019
Çandî - Giştî - Serbixwe
67

KURD BACA XEWNA XWE DIDIN

Welat

PEYVA WELAT

Kovara **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Kurd baca xewna xwe didin

Desteya sernivîs

Ji roja ku welatê kurdan hatiye parçe kirin û di navbera çar dewletan de hatiye parvekirin heya îro roj, dawî li êş û azariyên gelê kurd nehatiye.
Wekî mafekî rewa, xewna kurdan ew bû ku kurdisata wan ji bin destê dagîrkeran rizgar bibe û ew jî mîna hemû miletan li ser xaka xwe ya dîrokî azad bijîn, lê rêkeftina Saykis-Bîko ew ji vî mafî bêpar kir.
Ji wê hingê ve heya vê kêliyê, xebat û tekoşîna gelê kurd ranewestiyaye.
Li her çar dewletên ku xaka Kurdistanê li ser wan hatiye parvekirin bi dehan şoreş û serhildan li dar ketin.
Gelê kurd di pêvajoya xebat û tekoşîna xwe de hemû şêwazên tekoşîn û berxwedanê ên rewa bi kar anîn, û li ser dirêjahiya sed salî, xwîna ku gelê kurd ji bo azadî û serxwebûna xwe, herweha ji bo berevaniya di ber hebûna xwe de rijand têra avakirina deh dewletan dike.
Lê mixabin, ji ber parçebûna kurdan ji hêlekê ve, û hişmendiya dijminên gelê kurd û berjewendiyên zirhêzên cîhanê ji hêleke din ve, mafê gelê kurd tê perçiqandin û daqurtandin, û xwîna kurdan di bazarên qirêj de tê kirîn û firotin.
Dijminên gelê kurd bi ti awayî mafê kurdan qebûl nakin, û bi behaneya ku kurd cudaxwaz in şerekî hovane li dijî wan dimeşînin.
Tevî ku gelê kurd hewl dide ku mafê xwe yê rewa di çarçoveya dewletên (Sûriya, Îran û Turkiyê) de bi dest bixîne, lê ev dewlet rênadin ku kurd wekî welatînin xwedî maf di hundirê welatê xwe de bijîn. Lêbelê ew dixwazin ku kurd hetahetanî ji wan re kole û benî bimînin.
Kurd ne cudaxwaz in, lê siyaseta şofînîst a ku desthilatdarên dewletê li dijî gelê kurd meşandin û hîn jî dimeşînin, kurdan ber bi cudaxwaziyê ve didehfînin.
Heya ku ev hişmendiya çewt û qirêj ji holê ranebe, û ev welat li ser bigeha dadî û wekheviyê ava nebin, û mafê kurdan di hundirê van welatan de neyê parastin û misoger nebe, dê kurd xwe wekî welatî di hundirê van welatan de nebînin.
Ji sed salî ve xewna kurdan sar nebûye, ew di dil û mejiyê her kurdekî-ê de hatiye çandin, û çendî dijmin siyasetên qirkirin û bişaftinê bi kar bînin nikarin vê xewnê ji hiş û sewdanê kurdan rakin û dîrok li ser vê yekê baştirîn govan e. ■

تَبَنَّى ثورة
adopt a revolution

ÇIMA DIVÊ RÊBERA RASTENIVÎSÎNÊ BINGEH BIHÊ GIRTIN?

Nêçîrvan Rojava

Bi serperiştîya Weqfa Mezopotamyayê û bi beşdarbûna birek ji zimannasên zimanê kurdî, berhemeka bi navê Rêbera Rastenivîsînê hat amadekirin. Di pirtûkê da rêz û rêçikên rastenivîsîneka standard ji bo zimanê kurdî hatin zelalkirin û bingehekî xweragir ji bo wî hat danîn. Rêbera Rastenivîsînê ji tevlihevîyên ku zimanê kurdî rastî wan dihat, çare û bersivek bû. Ji ber ku êdî rewş gihaştbû wê astê ku ne tenê her dezgeh an sazîyek, lê belê her kesayetek li gorî xwe û derdor û gundê xwe, teşe û celebekî nivîsînê saz kiribû yan jî hilbijartbû û bi komekê dabû pejirandin, bê ku bala xwe bide metirsî û zîyanên vê gavê li ser paşeroja zimanê kurdî û xwendevan û xwînerên wî. Bi ser ve zêde jî hertim wî alî şêweyê nivîsîna xwe yê herî rast û dirûst didît û bi tenê li gel çend kesên li derdora xwe dirûvekî nû ji nivîsîna zimanî ra diafirand.

"...Herçî kitêbên dersan in jî ji hevûdin cuda cuda ne. Di her kovar û rojnameyeka me da, mirov pir bi hêsanî dikare behsa qayîdeyên cuda bike. Di medyaya dîjîtal da em hertim bi van cudayîyên nivîsîna kurmanîyê ra rû bi rû dibin. Kitêbên rastenivîsînê yên ku berî niha hatine weşandin jî ji cudayîyan ne bêpar in. Di dezgehên me yên weşanê yên din da jî standardên cuda xuya dibin. Heta, di warê tîpên alfabeya kurmancîyê de jî cudayî hene." Bi van hevokan, Rêber di pêşgotina xwe da, sedemên jidayîkbûna[1] xwe yên ku zêdeyî weha zelal nabin, xweş eşkere dike.

Herçiqas ez ne bi peyrewîya cavgirtî ra bim, ji wê qasê zêdetir ez li dijî redkirina bêlêkolîn, valaderxistin û reşkirinê me. Lewra heta mirov çi tiştî bipejirîne yan jî red bike, divê baş wî binase û bandorên redkirin û erêkirinê jî di ber çavan ra derbas bike. Ji bilî vê yekê tu wate ji redkirin yan erêkirinê ra namîne. Loma ez dikarim çend sedeman ji pejirandina vê pirtûkê ra li gorî nêrîn û dema mijûlbûna xwe ya di warê zimanê kurdî da, rêz bikim:

- Gelê kurd berî zimanê xwe, pêwîstîya wî bi lihevkirinê û pejirandina hevûdin heye. Ji ber ku ji êş û janên kurdan dîyar e ku heta niha hêj nikarin li hev kom bibin û li ser tu mijarê li hev bikin. Loma komxebateka weha ku ji her çar parçeyên Kurdistanê zimannas û kesaytên têkildarê zimanî, tev lê bûne, karekî pir binirx dihê dîtin, nexasim ku mijar zimanê kurdî ye. Ji belî vê yekê jî berî çapikirina Rêberê, destnivîsa wê ji gelek sazî û kesaytên ku bi kurdîyê mijûl in ji bo nirxandin û têbînîyan hatiye şandin û nêrîn û bersivên wan, li gorî ku komîteya amadekar dibêje, di ber çavan ra hatine derbaskirin.
- Hemû kesayetên beşdar bi zanist û tecrûbeyên xwe navdar in. Herweha pirtûkên çend kesayetan ji wan, ji bo bireka mezin ji xwendevanên zimanê kurdî -ta bi kesên ku niha Rêberê

1 Berî wê pirtûkek bi heman navî ji hêla Mistefa Aydoganî ve hatibû amadekrin û komxebata kuurnacîyê ew pirtûk bingeh girt.

red dikin- jêder û çavkanî ne. Tekez ev nayê wateya biçûkirin an paşguhkirina kesayetên nepeşdar, ji ber ku çi kesê ku rajeya vî zimanî bi qasî serê derzîyê jî bike, li nik hemû kurdan cihê rêzgirtinê ye.

- Devoka herêm, bajar, gund û taxa mirov ji nirxandina mijarên zimanî ra nabe pîvan. "... ne dûrî aqilan e ku kurmancîaxêv –çi pê bihesin çi jî pê nehesin- di bin tesîra wan zimanan (zimanên welatên cîhanê yên cuda) û wan rastenivîsînan da li rastenivîsîna kurmancîyê binêrin. Gelek nivîskarên kurmancîyê tevî ku li welatê xwe ne jî di bin tesîra rastenivîsîna zimanên xwe yên bîyanî yên din da ne. Nimûneyên rastenivîsînê yên cuda di berhemên wan da xwe didin der." Di pêşeka Rêberê da behsa bandora zimanê dewleta serdest li zimanê kesê kurmancîaxêv dibe. Lewra xwerûbûna kurdîyê bi zor û sed zehmetî dê peyda bibe, ji ber vê yekê devoka tu kesî ji nirxandina mijarên zimanî ra nabe bingeh. Lê belê ya rast ew e awayê têrbelav ku piranîya kurdan bi lêv dike, bihê pejirandin. Li alîyekî din bihaneya "ziman her ku diçe sivik dibe", li ser her mijarê pêk nayê. Anku sivikbûna ku hêmaneka bingehîn ji ziman wêran bike, êdî nabe sivikbûn.
- Redkirina hin xalan ji Rêberê, nayê wê wateyê ku bi tevahî bihê redkirin. Ji ber ku divê kurdhez hewla sererastkirina wan xalan bikin, ne ku ji xwe ra bikin hicet ji bo ku berhemê bi giştî nepejirînin.
- Helbet çi kar bihê kirin, dê ji sedî sed ne tekûz be, herweha dê ji şaşî û kêmasîyan ne parastî be. Herçî berhemka kurdî ye ji kovara nemirê Mîr Celdatî û heta Rêbera Rastenivîsînê –tevî rêz û hûrmetê ji wan ra- ne Quran ne jî Incîl e. Ji lew ra weke ku zanist herdem di pêşveçûn û veguherînê da ye û ji ber ku zimanê kurdî beşek ji wê zanistê ye, tekez dê ji wê veguherînê ne bêpar be. Loma çi mijar di çi pirtûkê da be, çiqasî rast be jî eger bi demê ra û di encama xebat û lêkolîna li ser zimanî, encemeka rastir derket, gerek e ew encam cihê xwe bigire.

Ji weha zêdetir em dê derbasî hûrgilîyên Rêberê nebin. Ji ber hemû sedemên navbirî û ji ber pêwîstîya gelê kurd bi lêvegerkê ku arîşeyên zimanê wî çareser bike, çi xebata ku di perjewendîya zimanî da be, lazim e were bipêşxistin. Mijar ne mijara pejirandin an redkirina berhemkê ye, lê belê mijar bi hawarhatina zimanê kurdî ve ye; çimkî kurdî gihaştîye wê qonaxê ku eger standard nebe, dê êdî hew kontrol bibe. Bi vê yekê bingehgirtina Rêbera Rastenivîsînê û avakirina li ser wê, dê ji êşa zimanê kurdî ra bibe derman. ■

4

تتمة المقال: **الألْـوَان.. مصدرُ الجمال وَالإمعَان**

، وما ذلك إلاّ نتيجة الإشراق وضدّه.

ويقول عمرو بن كلثوم:

بِأنَّا نُوردُ الرَّاياتِ بيضاً وَنصدرهنَّ حمراً قَد رَوينَا

فالرَّايات البيضاء رمز النَّقاء والصَّفاء الَّذي لا يلبث أن يخالط الأحمر الَّذي يرمز إلى الدِّماء والحياة والشَّباب. ويقول الوأواء الدّمشقي :

فَاستمْطرتْ لُؤلؤاً مِن نَرجسٍ وَسَقتْ وَرداً وَعَضَّتْ علَى العنَّابِ بِالبرَدِ

ومع التَّقدُّم الحضاريّ أخذَت أهميَّة الألوان تتنامى ، ففي المناسبات السَّارَّة يُهدَى الورد الأبيض. ومِن التَّقاليد الاجتماعيَّة أن ترتدي العروس حلَّة بيضاء ، في حين يظهر الزَّوج بزيٍّ قاتم. واصطلحت حركة السَّير على الأخضر والأحمر والأصفر ، وهذه الألوان الثَّلاثة هي الوحيدة الَّتي تنتهي بحرف الرَّاء مِن بين الألوان. ■

الألْوَان..
مصدرُ الجمال وَالإمعَان

بقلم: علاءالدين حسن

بلاغة الطَّبيعة هي الألوان.. لغة الحياة وأحد دروب المعرفة.. ولو تصوَّرنا العالم مِن حولنا دون ألوان ؛ لرآيناه مثيراً للكآبة.. فاللَّون مصدر الجمال ، والمرء حيثما اتَّجه يرى أمامه الألوان تتجسَّد في زرقة السَّماء والبحر ، وفي خضرة الأشجار..

لقد طالت الألوان جميع جوانب الحياة بما تحمل مِن رموز ودلالات حتَّى دخلت عالم الطِّب.. فالثَّمر والجبال والنَّاس والدَّواب ، كلُّ ذلك بألوان مختلفة ، ممَّا يدعو إلى التَّأمُّل بدقَّة:

[**وَمِن آياتِه خلْقُ السَّمواتِ وَالأرضِ وَاختلافُ ألسنَتكم وَألوانِكم..**]. الرُّوم: ٢٢.

والألوان تتناغم وتتناسق.. هي ـ بحسب أرسطو ـ عناصر الوجود. ويقول دافنشي : أوَّل الألوان هو البياض الَّذي مِن دونه لا تكون الرُّؤية ، والأصفر للتُّربة ، والأخضر للشَّجر ، والأزرق للماء ، والفضاء ، والأحمر للنَّار ، والأسود للظَّلام. ويقول نيوتن: كلُّ الألوان في الأبيض.

وثمَّة صلة بين اللَّون والضَّوء ؛ فرؤية الألوان تستحيل في الأماكن المظلمة. واللَّون نتيجة لظاهرة الطَّيف الضَّوئيّ ذي الألوان السَّبعة. والأحمر مِن الطَّيف موجته أطول مِن البرتقالي ، والبرتقاليّ موجته أطول مِن الأصفر.. وهكذا.. وسرعة الألوان واحدة ٣٠٠ ألف كلم / ثا.

والألوان الَّتي تواترها أقلّ مِن تواتر الأحمر تسمَّى: الأشعَّة تحت الحمراء. والَّتي تواترها أكبر مِن تواتر البنفسجيّ تسمَّى : الأشعَّة فوق البنفسجيَّة.

وعندما يمرُّ الضَّوء عبر قطرة ماء ؛ فإنَّه ينحني ، ويتكوَّن الانكسار الضَّوئيّ ، ويظهر قوس الرَّحمة.

معَانٍ إيحائيّة:

فالأخضر يوحي بالعطاء: [**وَيلبسونَ ثياباً خُضراً مِن سندسٍ وإستبرَق**]. الكَهف : ٣١. والأصفر يدلُّ على الكمال ، والأرجوانيّ يدلّ على الاستقرار. والأبيض لون رداء الإحرام ، ومِن غرائب الطَّبيعة : اللَّيالي البيض ، وهي : الثَّالث عشر والرَّابع عشر والخامس عشر مِن كلِّ شهر قمري ، وفيها تصبح اللَّيالي بيضاء ؛ لاكتمال القمر.

أمَّا الحجر الأسود فهو مِن أعرق التَّسميات. والأسود لا يعكس أيّ ضوء ؛ لأنَّه يمتصُّ كلَّ الألوان ، وهو رمز الحزن. والأزرق لون الغلاف الجويّ ، والماء في البحار والمحيطات أزرق ؛ لانعكاس لون هذا الغلاف ، والأحمر صفة الدِّفء ، وهو حبّ حارق. وثمَّة بحران : الأبيض (شمال أوربا) ؛ لأنَّ مياهه بيضاء معظم السَّنة ، والأبيض المتوسِّط ؛ لكثافة السُّحب البيضاء في سمائه. أمَّا الأحمر ؛ فلوجود المرجان الأحمر في مياهه.

والأسود بسبب الغيوم السَّوداء في سمائه. والبيت الأبيض ؛ لأنَّه يُصبَغ بالأبيض. والموت الأسود هو الطَّاعون ، أمَّا الحمَّى الصَّفراء فهي مِن أمراض الحِجْر الصِّحّي.

مَيزات وَأنسنَة:

تذهب نزعة أنسنة الطَّبيعة إلى منح الألوان رموزاً محدَّدة.. فالبنفسجيّ تأمُّل وتفكير، والأخضر خصب دائم ، والأزرق حركة وتواصل ، والرَّماديّ حذر وكتمان وقد يكون محايداً في بعض الأحيان ، والأبيض براءة ونقاء. واليد البيضاء هي المعطاءة. والأسود خوف وترقُّب. وقد هيمن اللَّون القاتم على أعمال ليوناردو ، واستحوذ البنّيّ على فان كوخ. وبراغ كان مأخوذاً بالأزرق؛ ذلك لضرورات بيولوجيّة.

عمَى الألوَان:

هو عيب بصريّ قد يصل إلى الفقدان التَّام ، وسببه الوراثة بالدَّرجة الأولى ، ومِن ثمَّ إصابة العصب البصريّ بالتهاب أو تسمّم بالتّبغ والكحول.

وقد لا يميّز كبار السِّنّ بين بعض الألوان. وهذا المرض يصيب الرِّجال أكثر ، ليس له علاج حتَّى الآن ، ممَّا ينبغي على المصاب أن يتكيَّف مع الحالة ويكتفي بما قُدِّر له. والوقاية مطلوبة مِن السَّائقين المصابين ؛ لسلامة القيادة أمام الإشارات.

التَّداوي بالألوَان :

إنَّ كلَّ لون له طاقة وتأثير على المريض ؛ فالأخضر لإزالة الإجهاد والتَّوتُّر وهو مريح للنَّظر ، والبنفسجيّ لتهدئة الأعصاب وقد يوحي بالأسى أحياناً ، والأزرق لتخفيف الصُّداع وهو يرتبط بالولاء.

والفيروزيّ للسَّكن والاستقرار وتجدُّد النَّشاط ، وفوق البنفسجيّ له ضرر على القلب والرِّئتين وقاتل لبعض الجراثيم. والنِّيليّ منشِّط للذَّاكرة. والزّهريّ له تأثير في الأعصاب الثَّائرة.

والبنّيّ يؤدّي إلى العزلة. والأحمر يعمّق العاطفة ويثير الشَّجاعة والشِّدَّة ، والأصفر يرتبط بالضّوء ويطلق على الذَّهب الأصفر ويرتبط بالشَّمس ، والأسود خوف مِن المجهول.

واستخدم فيثاغور الضّوء الملوّن في المداواة منذ أكثر مِن 2500 عام.

وأثبت العِلم أنَّ للألوان قوَّة تتحكَّم في سلوك الإنسان ؛ فالمتفائل ينظر بمنظار وردي ، والمتشائم ينظر بمنظار أسود. والهالة الشُّعاعيَّة ما هي إلاّ بارومتر يقيس لنا مدى قدرة الجسم على تحقيق التَّوازن.

كما أنَّ الكثير مِن الحيوانات تأخذ اللَّون الملائم للبيئة المحيطة بها ؛ فالنَّحل يميّز الأخضر أكثر مِن الإنسان ، والهرّ يرى في العتمة ، والصَّقر يرى في ضوء الشَّمس ، والثَّور لديه عمى الألوان. ومعظم الحيوانات لديها عمى تجاه الأزرق.

الألوَان وَالتُّراث:

إنَّ ظاهرة الألوان في التُّراث ظاهرة تلفت النَّظر ، ومِن قديم بدت الصُّورة الجماليَّة في هذا التَّضادّ الرَّائع بين البياض والسَّواد في القصيدة اليتيمة لـ : دوقلة المنبجي :

الوَجهُ مِثلُ الصُّبحِ مبيضٌ ... وَالشَّعرُ مثلُ اللَّيلِ مُسودُّ
ضدَّان لما استَجمَعا حَسُنا ... وَالضِّدُّ يُظهرُ حُسنَه الضِّدُّ

وثمَّة بيان جميل للشَّاعر العباسيّ المغمور ماني الموسوس يقول فيه:

نَشرتْ عذائرَ شَعرِها لتُظلّني ... خَوفَ العُيونِ مِن الوشاةِ الرُّمَّقِ
فَكأنَّه وَكأنَّها وَكأنَّني ... صُبحانِ بَاتَا تحتَ لَيلٍ مُطبقِ

وهذان البيتان مِن أروع ما قيل في الشِّعر العربي ؛ حيث وصل الشَّاعر إلى ذروة الخيال قد لا نقدر على استحضارها

تتمة المقال على الصفحة ٤

من خلال قصائده الشعرية، وكتبه الأدبية، بل مال إلى التبحر في مختلف العلوم، فأنكب دارساً العلوم والفنون المختلفة مثل الرياضة والرسم والشعر والموسيقى والتصوير، كما قام بدراسة النبات والطب والهندسة والحقوق والسياسة.

وعكف على تعلم اللغات وساعده والده في ذلك فدرس كل من اللاتينية، اليونانية، الإيطالية، الفرنسية، الإنجليزية والعبرية، كما سعى غوته نحو التعرف على ثقافات أخرى فتعمق في الأدب الشرقي، مطلعا على الأدب الصيني والفارسي والعربي، بالإضافة لتعمقه في الفكر الإسلامي، ولم يكتف غوته في مجمل اطلاعه على الثقافة العربية على الشعر العربي، فقط بل اطلع على كتب النحو والصرف متلهفاً وساعياً نحو المعرفة، كل هذه الأمور أهلته لأن يكون شاعراً متمكناً واسع الثقافة مطلع على العديد من العلوم.

كان له بالغ الأثر في الحياة الشعرية والأدبية والفلسفية وقد تنوع أدب غوته ما بين الرواية والكتابة المسرحية والشعر وأبدع في كل منهم، واهتم بالثقافة والأدب الشرقي واطلع على العديد من الكتب فكان واسع الأفق مقبلاً على العلم، متعمقاً في دراساته.

من خلال هذه المقدمة حاولت التمهيد لدخول عالمه الرّوحي والصوفي على غرار عالم الشيرازي وحبه له.

فحافظ الشيرازي من أهم الشعراء الفرس المتصوفة تأثر به الكثير من شعراء الغرب وادهشهم بلغته الروحيّة وولوجه عالم الخيال من أوسع أبواب الواقع الذي عاصره وكان محط أعجاب اغلب شعراء الغرب واكثرهم الشاعر العالمي الألماني غوته الذي سبر مكنونات الشيرازي شعراً وحياة لدرجة الانصهار في عالمه ومجاراته بالكتابة في ديوانه وعنوّن قسما ب»حافظ نامة» أي رسالة حافظ .

وأكثر ما استثار حفيظة الشاعر غوته ما قاله الكاتب عبد الرحمن بدوي في مقدمة ترجمته العربية للديوان الشرقي ، كان إقبال حافظ على السرور، أي بكلمات اكثر وضوحاً على الاستمتاع «بكل ما تأتي به اللحظة الحاضرة واللحظة متدفقة في غير إسراف، سعيد حكيم يأخذ بحظه من متع الحياة، وينفذ من بعيد الى طوايا الألوهية. ولكنه ينكر اللذة الحسية وممارسة الشعائر الدينية. وبالجملة يكشف عن اثر شاكّ وحُميّا قلقة. وإلى هذه الصفة الأخيرة من الأثر الشاكّ والحميا القلقة في نفس حافظ يعزو غوته ما يشاهد في شعر هذا الأخير من تناقض». ويضيف «على رأي غوته، يكون علينا ان نأخذ بما يقتضي صريح كلام حافظ، وألا نلجأ الى التأويلات الخيالية التي تحيل الظاهر الى باطن وكل صريح الى رمز. وإن كان هذا لا يمنع من تعمق المعاني التي يوردها، وعدم اخذ النص بحروفه». الماضية في اللحظة الحاضرة. كما استهواه فيه سخريته من الزاهدين العازفين عن الحياة،»

غوته والشيرازي كانا ممن يدعون للتنوير من خلال التفكير بالعقل في فهم الأشياء وماهيتها والإحاطة بكل جوانب اللغة وما وراءها من عالم غير المادي المحسوس

هذا وكان قد تعرَّف على الشاعر الفارسي (حافظ الشيرازي) ، من خلال الترجمة الألمانية التي قام بها المستشرق (هامر بورجشتال) لبعض قصائد «حافظ»، وعندما قرأها امتلأت نفسه إعجابًا بقوَّة الشعر الفارسي، فقال مادحًا «حافظ»:

فلتكن الكلمة هي العروس
ولتكن الروح هي العريس
مَن يُنشِد في مدح حافظ
فقد شهد هذا العرس

أذاً كلاهما تطرقا للبحث والتنقيب في عوالم الذات ومكوناته وتركا أثرا كبير في الأجيال اللاحقة.

غوته والشيرازي
في
مهب التاريخ

مروان شيخي

كثيرون من الشعراء الغرب حاولوا تسلق جدران الرّوح بسلاسل الحرف المذهب من ماء الحقيقة إلى سماء الكلمة وما وراءها من عوالم تُخفى على الانسان العادي بتفكيك شيفرتها الغامضة والتفاعل معها بروح العصر .

أحاول هنا أن اطرق باب الروح من خلال العلاقة التي ربطت الشاعر الألماني يوهان غوته مع الشاعر الإيراني حافظ الشيرازي حينما قال :(من يرغب في استيعاب الشعر/ فعليه الذهاب إلى بلاد الشعر ومن يرغب في فهم الشعراء فعليه الذهاب إلى أرض الشعراء).

كلنا يدرك أن الشاعر غوته كان بمثابة جسر يربط الشرق بالغرب من خلال الكلمة الرّوحية

وارتباطه الوثيق بالأدب الشرقي وآثارهم خير دليل على ذلك وقد خصَّ الشرق بديوانه الشرقي لهو دليلٌ صارخٌ نبع من اهتمامه وشغفه في حقيقة الكلمة حيث قال في إحدى قصائده :

لله المشرق
لله المغرب
الأراضي الشمالية والجنوبية
ترتاح في سكينة يديْه

الشاعر يوهان غوته ولد عام ١٨٣٢ يعتبر من أشهر الأدباء في المانيا ولم يكن مجرد شاعر عادي يسجل خواطره وأفكاره

ج- منذ اللحظة التي بدأت فيها بالكتابة كنت أعتبر أن كل ما أكتبه إنما هو تمهيد لنمط آخر، بدأت بالشعر ثم القصة، ، ثم جاءت روايتي الأولى التي استغرقت كتابتها أربع سنوات بالتزامن مع ديوان شعر ومجموعتين قصصيتين، الرواية لدي جاءت بعد مرحلة النضوج الأدبي، ولم أشأ لرواياتي أن تخوض في المألوف والمتعارف عليه بل على العكس تماماً، الكتابة في القضايا الإشكالية ومواجهة التحديات والمخاطر بأنواعها يجعل للنص أهمية، حين يشعر القارئ أنه جزء من القصة وأنها تحكي عنه وتطالب بحقوقه ، أن يكتشف المتلقِّي في النص ما كان يبحث عنه ، ذلك يعني أن ذلك النص أصبح عابراً للحدود وملهما وقادراً على التغيير، أعتقد هذا رأيي قُرَّاء رواياتي.

٧- خصوصيتكم كأنثى و من ثم ككردية إلى أي مدى أثر على نتاجكم الأدبي ؟

ج- كان له التأثير الكبير، أن يكون المرء أنثى في مجتمعاتنا، هذا يعني أنه يعيش حالة حرب دائمة ، أما وأن يكون المرء أنثى وامرأة كردية، فلا أخفي أنَّ هذا الكائن المزيج الخاضع لتبعات جنسه والخاضع لانتمائه ولا يستطيع عن أي منهما الفكاك, كان لابد أن يعاني تبعات الأمرين معاً، ضمن الإطار العام فالكاتب سواء أكان أنثى ام ذكر فالأمر مرهون بالفكرة وبمنطق الكتابة، برأيي مفهوم الكتابة النسوية أو الذكورية هي مفاهيم من اختراعنا نحن وفق منطق تفكير مجتمعاتنا الشرقية و لا علاقة لها بالجندر، أنا لم أولي لكوني انثى الأهمية الكبرى، كتبت وأكتب في المواضيع والأفكار التي يجدر بي الكتابة فيها وإن كنت قد خصصت جزءاً منها للمرأة عملاً بواجبي اتجاهي واتجاههن.

٨- ما هي التحديات التي واجهتكم خلال رحلتكم الأدبية ؟

ج- سبق وقلت أن يكون المرء أنثى في مجتمعاتنا هذا يعني أنَّه يعيش ويسير ضمن حقل ألغام كصعوبات وتحديات يجب أن يواجهها ليبقى على قيد الحياة، لم يكن دربي سهلا، بل عانيت ما عانيت من سوء تقدير ومن المطرقة الاجتماعية المختزلة في الشرف(شرف المرأة) نعم أي أنثى تغرد خارج المتعارف عليه أو تحاول تغيير المألوف فإنَّها تفقد العائلة شرفها وكرامتها، لكن كل ذلك زادني إصرارا يوما بعد يوم إنطلاقا من إيماني بذاتي وبقدرتي على التغيير، والصبر الطويل والمواظبة كل ما سبق وغيرها من التحديات كانت أدواتي للبقاء في وجه المظالم الاجتماعية، تلك الأدوات كانت الشيفرة السرية لإثبات الحضور.

٩- من المعروف بأنكم عملتم و تعملون كناشطة للدفاع عن حقوق المرأة ، ماذا حققتم في هذا المجال و كيف تقيمون وضع المرأة الكردية في هذه المرحلة ؟

ج- كل ما أقوم به لاينفصل عن بعض، الكتابة هي الأداة التي بها أمارس كل نشاطاتي سواء أكانت أدبية او حقوقية او غيرها، فهي نوع من الدفاع عن حقوق الإنسان، أكتب في الإشكاليات الحياتية، وعملي كناشطة كان تجسيداً واقعيا لرغبتي في تقديم الدعم والمساندة للمحتاجين، في بداية الأزمة السورية أسست جمعية آسو لمناهضة العنف ضد المرأة ، كنا جميعاً(العضوات) مؤمنات بهذا العمل الحقوقي من أجل رصد وتوثيق الانتهاكات في الكثير من الحالات التي تعرضت لها النساء إبَّان الأزمة، قدمنا خلالها المساعدة والدعم للنساء اللواتي كن بحاجة إلى الاستشارات القانونية أو للتدخل في حل المشكلات الاجتماعية للعديد منهن، لكن عمل الجمعية توقف على أرض الواقع مؤقتاً بسبب هجرة معظم العضوات وما تبقى منهن غير قادرات على تحمل الأعباء الكارثية التي تتعرض لها منطقتنا الكردية في المرحلة الحالية، لذا فإننا آثرنا العمل أونلاين ريثما ننهض من جديد بها.

المرأة الكردية امرأة جديرة بان تكون موجودة ضمن تفاصيل الحياة لما تملكه

تتمة المقال على الصفحة ١١





وجيهة عبد الرحمن

"الكتابة هي أداتي لتغيير العالم
وللنضال من أجل القضية الكردية"

حاورها : عمران يوسف

١- لكل بداية أدبية قصة مختزنة في ذاكرة الكاتب فهي قصة الولادة الثانية ، قصة مغامرة الخوض في هذا المعترك الأدبي بكل ما يحمله من تحديات، ماذا تخبرينا حول تلك البدايات ؟

ج- البداية هي حجر الأساس لكل انطلاقة ، ما أن تخطو أول خطوة، تلك هي البداية، أحيانا نبدأ دون معرفة مسبقة بمآلات بدايتنا، أما أنا فقد كانت بداياتي مع عزلتي والوحدة والسور العالي الذي بنيته حولي، وحدة عشتها دون علم أحد من أفراد العائلة التي لم يكونوا في كل الأحوال ليلاحظوها، أنسنة الموجودات، الانزواء في الزوايا الضيقة للمنزل الكبير للعائلة الكبيرة، شجرة الرمان في حديقة بيتنا وذلك السور الحجري الذي بناه والدي كيفما اتفق، ثم تلك القصص القصيرة الأمد التي لم أكن لأجرؤ على إخبارها أو سردها، لأنها كانت حول مغامراتٍ صغيرة بريئة، كل تلك الأشياء وغيرها الكثير كنت أدونه في دفاتر صغيرة لأكتشف فيما بعد أنني أملك الكثير الذي يجب أن يقرأه العالم، والذي عمل على بلورة تجربتي الأدبية.

٢- ديريك و ذكريات الطفولة، أي حيز يشغلان من روح الكاتبة وجيهة عبد الرحمن و ما مدى تأثيرها في صياغة شخصيتكم الأدبية ؟

ج- يقال أن الأمكنة تعمل على شحذ الذاكرة وصقلها، ديركاحمكو بالنسبة لي ليست مجرد مكان أو مسقط رأس، الأمر ذهب إلى أبعد من ذلك، وهو أن روحي حتى هذه اللحظة تأبى أن تغادر ديرك بالرغم من خروجي منها منذ أكثر من ربع قرن من الزمن ، الكمُّ الهائل من ذكريات الطفولة الحزينة وأحيانا السعيدة، كانت كفيلة بأن تبقيني حبيسة ذلك المكان، حاولت توظيف ذكرياتي هناك في كتبي لعلي أخرج منها وتخرج مني، ولكن عبثاً كان ذلك، اعتقد أن الموضوع متعلق بتلك البقعة من الأرض التي تمنحك الأمان والحكمة، أنها علاقة جدلية بين ديرك وذكريات الطفولة وما صرته لاحقاً، إنَّها معادلة كيميائية متوازنة الطرفين.

٣- بدأتم شعرا ثم انتقلتم إلى كتابة القصة و الرواية ماذا تخبرينا حول هذه الرحلة ؟

ج- بدأت بكتابة الشعر كتعبير عن الحياة التي كنت أعيشها بمجمل تقلُّباتها، لم أُخضع قصيدتي يوماً إلى القياس أو الوزن لأنَّني أردتها أن تكون حرة كما كانت روحي دوماً، ولكن بالرغم من ذلك كنت أشعر أن هناك روائية في داخلي، لذلك كان الشعر والقصة السلم الأدبي للوصول إلى مرحلة كتابة الرواية، والتي تقريبا وضعت حداً لكتابة القصة، أما الشعر فقد بقي شحيحاً، علماً أنَّني أملك خمس مجموعات قصصية وأربعة دواوين شعرية، مع ذلك أعتبر الرواية ملعبي.

٤- ماذا تعني لكم القصيدة و لماذا ابتعدتم عن كتابتها ؟

ج- القصيدة هي الحالة الناتجة عن الوعي بالذات وبالعالم من حولنا ، إدراك الأشياء بالعقل الذي يعالج ما نريد الكتابة عنه شعراً في معملنا الأدبي ليصل إلى الآخر بسلاسة، أنا لم أتوقف عن كتابة الشعر ولن أتوقف ، لكن الأمر يبدو أن له علاقة باللحظة التي تغلبني فيها الحالة الشعرية حين اعجز عن تدوينها في نص سردي روائي، أصبحت مقلة في كتابة الشعر ولكني أعوض ذلك في تحميل رواياتي أعباء الشعر والقصة.

٥- بعد الهجرة و خاصة في السنوات الأخيرة زاد انتاجكم الأدبي بشكل ملحوظ، إلى ما تعزون ذلك ؟

ج- بالرغم من أنَّني لم أكن راغبة في مغادرة البلد، ولكن حدث ما حدث وكنت من المغادرين، هنا في ألمانيا حيث الأمكنة الواسعة والطبيعة الساحرة والأهم الحرية التي أتمتع بها في الكتابة ، ثم الوتيرة المتسارعة للأحداث في البلد وغيرها من العوامل ، أعتقد كان لها الدور في زيادة نتاجي ، ولأن الكتابة هي أداتي لتغيير العالم وللنضال من أجل القضية الكردية فقد عملت على توظيف هذا المكان في خدمة تلك الرسالة، الزخم في الكتابة في المجتمعات الغربية مقترن بالحرية التي هي ملكك النهائي إزاء كل التحديات سواء أكان هنا او هناك او في أية بقعة من العالم.

٦- أثبتم حضورا أدبيا مميزا على مستوى الرواية، ماذا تخبرينا حول هذه التجربة ؟

تتمة المقال على الصفحة ٨



وجيهة عبد الرحمن
كاتبة وروائية كردية من سوريا، مقيمة في ألمانيا ,رئيسة جمعية آسو لمناهضة العنف ضد المرأة في سوريا , باحثة اجتماعية في مجال الطفل والمرأة والأسرة ,تكتب الرواية والقصة والشعر.
لها في مجال الرواية:
- الزفير الحار- رواية عن دار رؤية بالقاهرة ٢٠١٢ مترجمة إلى اللغة الكردية- دار سرسرا برلين ٢٠١٩
- لالين _ رواية صادرة عن المؤسسة العربية للدراسات والنشر٢٠١٦ ترجمت إلى الفرنسية
- العبور الخامس كُتبت في ألمانيا بعد الهجرة –صادرة عن دار الخليج بالأردن ٢٠١٧
- كعبٌ عالٍ- مخطوط
في القصة لديها خمس مجموعات قصصية:
الأولى بعنوان (نداء اللازورد)٢٠٠٦ عن دار الزمان بدمشق
والثانية بعنوان (أيام فيما بعد)٢٠٠٨ عن دار الزمان بدمشق
والثالثة بعنوان (أم لوهم البياض) ٢٠١٠ عن دار الزمان بدمشق
الرابعة بعنوان (الإفريز) ٢٠١٥ عن دار الخليج بالأردن
الخامسة بعنوان أسئلة الحواس الخمس - ٢٠١٨عن دار السكرية
وفي الشعر:
كن لأصابعي ندى – شعر - دار رؤية- القاهرة٢٠١١
Wisaديوان شعري باللغة الكردية ٢٠١١ صادرة عن اتحاد أدباء كردستان- فرع دهوك
تمائم- ديوان شعر_ محطوط
امرأة غيري- ديوان شعر _ مخطوط

لها العديد من البحوث الاجتماعية الخاصة بالمرأة والطفل والأسرة .
- عملت كباحثة اجتماعية أيضا في سجن النساء في مدينة الحسكة ٢٠٠٢ من أجل إعداد بحث سيكولوجي بعنوان (سيكولوجيا الجريمة عند المرأة)
حاصلة على العديد من الجوائز الأدبية في مجال القصة على مستوى سوريا والخارج
جائزة نقابة المعلمين المركزية عام ٢٠٠٤
جائزة البتاني عام٢٠٠٥
جائزة اتحاد الكتاب العرب عام٢٠٠٦
جائزة مهرجان الخابور الأول عام ٢٠٠٦
جائزة عبد السلام العجيلي للقصة القصيرة ٢٠٠٨
جائزة مجلة العربي الكويتية لثمانية أعدادعام٢٠١٠- ٢٠١١-٢٠١٢
جائزة الأديب الكبير عبد الباسط الصوفي للإبداع عن مجموعها(الإفريز) عام٢٠١٠
- المركز الأول في جائزة نجيب محفوظ على مستوى الوطن العربي٢٠١٢عن مجموعتها أسئلة الحواس الخمس - نص(مسرحية ما- فصول الأرق) تجسد مجزرة حلبجة.
وغيرها من الجوائز...

من مقومات أثبتت من خلالها جدارتها وذلك بالانخراط في المجال السياسي والمجتمعي والأهم من ذلك انخراطها في صفوف المقاتلين كمقاتلة شرسة تواجه أكثر قوة شرسة همجية في العالم(داعش) علما أنني اتحفَّظ على دخولها ذلك المعترك، لأن العدو شرس بما فيه الكفاية ليجعلها مطية لتنفيذ مآربه الدنيئة.

لذا فأنا اطلب أن ينظر إليها بعيداً عن الصورة النمطية المكوّنة عنها ومنحها المزيد من الحرية وتوسيع رقعتها لتوثّق إيمانها بذاتها.

١٠- معظم نتاجكم هو باللغة العربية و لكم ديوان شعر باللغة الكردية، كيف تجدون العلاقة بين اللغة و الأدب ؟

ج- أنا لم اختر الكتابة باللغة العربية، لكنها فرضت على الكرد في سوريا من قبل النظام الاستبدادي، جميعنا عانينا ماعانيناه من التهميش والحرمان من التعلم بلغتنا الكردية، وتم تبديلها باللغة العربية التي هي لغة الدولة التي كانت تبسط سيطرتها علينا وكان ذلك كفيلا بأن تكون ثقافتنا عربية، هذا بالضبط ما حدث معي ومع الكثيرين من الكتاب الكرد، إلا أنني لاأجد في ذلك مشكلة كبيرة طالما أن ما أكتبه يصل إلى نطاق أوسع فيما إذا كتبت باللغة الكردية، ثم أن العربية هي لغة مطواعة وزاخرة بالمفردات والمرادفات الكفيلة بأن تمنحني القدرة على التعبير أكثر فيما أرغب في الخوض فيه، لذا عندما أكتب بالعربية اتمكن من الإحاطة بمكامن الفكرة أكثر والتمكُّن من إيصالها، ثم أنني ككاتبة كردية اعتبرها النافذة التي يطل منها العالم على الكرد وثقافتهم .

إذا اللغة هي الوسيلة للإيصال وإحداث التغيير وليس كما يقال بأن من يكتب بغير لغته إنما هو خائن لانتمائه، العملية فقط هي ان لاتخون ذاتك مع غير لغتك، والأمثلة كثيرة عن كتَّاب أبدعوا بغير لغتهم وأحدثوا فرقاً وتغييراً.

١١- كلمة أخيرة .

أشكرك على هذه الأسئلة الصريحة ..

أشكر كادر مجلة ولات ..

لم تكن المسافات يوما لتشكل عائقا أمام روحي لأكون في مكان ما، أقول لكل من تركتهم هناك ، أنا لم اغادركم يوماً، لأنكم هنا في قلبي وروحي وفي صفحات كتبي.

تتمة المقال على الصفحة ١٠

KOMA SERDEM ŞANOYA "VENASÎN" PÊŞKÊŞ KIR

Kovara Welat

Şano neynika civakê ye, û ji bo guhertin û pêşxistina wê alava şaristanî ya herî bi bandor û karîger e.

Demeke dirêj desthilata Sûriyê bi rêgeheke bîrdoz şerê çanda gelê kurd dikir, û bi mebesta qirkirin û bişaftina netewa kurd hemû çalakiyên çandeyî qedexe kiribûn. Lê piştî sala 2011an ku tê de şoreşa Sûriyê li dar ket, desthilata sûrî li ser deverên kurdî sist û lawaz bû, vê yekê zemîn xweş kir ku tevgereke çandeyî û hunerî berfireh û çalak destpê bike.

Piştî damezirandina rêveberiya xweser li rojavayê Kurdistanê çand û hunera kurdî bêtir çalak û geş bû, ji nav huneran xebatên şanogerî bi rengekî berz, berçav û çalak meşandin. Piştî lidarxistina çar mîhrîcanên şanoyê ên salane xebatên komên şanogerî berdewam in, herî dawî koma Serdem ya şanogerî şanoyek bi navê Venasîn pêşkêş kir, kovara Welat karê vê komê şopand û ev rapor amade kir.

Koma Serdem komeke leşkerî ye, û bi ser Erka Xweparistinê ve ye. lîstikvanên komê jî leşkerên erka xweparastinê ne, derhênerê komê hunermend û şanogerî naskirî Mihemed Resûl e. ev kom ji berî du salan ve hate damezirandin û cara yekem beşdarî çaremîn mihrîcana şanoyê ya (Yekta) bû, ew jî bi şanoya (Tu ne gara yî) ya nivîskar Ezîz Nîsîn, û gelek xelat li ser vê şanoyê wergirt.

Piştî mihrîcanê, koma Serdem dest bi karekî nû kir, ew jî şanoya (Venasîn) e, ku li ser textê şanogeha Mihemed Şêxo hate pêşkêşkirin.

Şanoya Venasîn ji nivîsa Imran Yûsiv e, û derhênana Mihemed Resûl e.

Mijara şanoya Venasîn di der barê têgîna rastiyê de ye. ew rastiya veşartî ya ku mirov bi xwe re dibe gorê û pê re tête binaxkirin, herwiha di der barê awayên xapandinê û sedemên wê de ye.

Bi riya pênc kesên mirî, şanoya Venasîn dixwaze wê rastiya tal û veşartî li pêşberî bîneran raxîne. Her kesayetek kateke civakî dinimîne û bi riya wê kesayetê awayên xapandina civakê xuya dibin.

Kesayetên şanoyê ên mirî bi lîska Venasînê dilîzin, û her yek ji wan rastiya xwe ya veşartî vedibêje û diyar dike.

(Qeyser- Dadwer- Kahîn- Jina qenc- û Mêrê nenas) her kesayetek ji van nûnertiya beşekê ji civakê dike.

Derhênerê şanoya Venasî Mihemed Resûl dibêje: "Min ev deq bijart çiku bi mijar, raman û gotara xwe pir balkêş e, ew pirsgirêka her mirovekî ji me dide ber çavan, pirsgirêka xapandinê û sextekirina rastiyê ye. Gelo çima mirov rastiya xwe vedişêre ? çima berrûk û maskan li xwe dike? Çima nikare rastiyê bibêje ? min xwest ez van pirsan li pêberî bînera raxînim, da ku her yek ji wan li bersiva van pirsan bigerî.

Erka hunera şanoyê guhertin û pêşxistina civakê ye, em jî hewl didin ku mûmekê di nava tariyê de pêxînin."

NALÎ (1797-1855)

Navê wî Mele Xidir e, navê bavê wî Şaweys e, li Şarezûrê, li gundê Qeredaxê sala 1797an ji dayik dibe.

Destpêkê li Silêmaniyê dixwîne, piştre diçe Şamê û du-sê salan lê dimîne, li paş wê diçe Stembolê û li wir gire-girên kurdan nas dike, ji wan Ehmed Paşayê Baban e, û helbesteke kurdeperwerî jî li ser dinivîse.

Di xortaniya xwe de, Nalî dil dikeve qîzekê, navê wê Hebîbe bû, û gelek helbestên evînî li ser xwe û wê dinivîse.

Nalî wekî damezînerê toreya Kurdî ya kilasîk li başûrî Kurdistanê tê hesêb.

Helbestên Nalî bi giştî tevhevin, ew hem yê dildarîyê ne, hem jî yên kurdperweriyê ne.

Ji ber êşa dildariya xwe, û ji ber derdê miletê xwe, navê Nalî li xwe kir, wekî navekî toreyî ku ew ji ber êşê dinale.

Dema ku Nalî li Şamê bû, ew xwendekarekî zîrek bû û wekî helbestvan jî hatibû naskirin.

Bi zaravên Kurdistanê baş dizanîbû, û dibêjin ku rêzmana erebî ji bo zimanê kurdî wergerandiye.

Nalî di sala 1855an de koça dawî dike û li gundê xwe tê veşartin.

Parçeyek ji Helbestek Nalî:

Ax li cem vê Hebîbê

Ax li cem vê hebîbê, pêbenda serê wê tune,
Ne şekir qende, bejna wê bilinde, qendê wê tune.
E'detekî wê heye : qet car ji kesî napirse,
Zalimeke bede, qet xeyfa xweda rinda mma wêtune.

Dayme derheq min sirke firoşe, bi rû,
Derheqî xeyrî min xêra şeker xendî nîne.
Xanaqa wê jî mezin wek meyxana kahreba,
Meclîsa wê heye , lê gep û gubendî têda tune.

Dîlbera mine, meşhûre bê hevtayî,
Bê şik şehbê xweda şahdê manendî wê tune.
Ehlê dinya li ber hirs û time' hişyarin,
Bi xusûsî bigere mest û xîremendî nîne.

Medresa mihbeseyê mibhîsê pir weswese,
Kesê têdayê, lê amadî xuresendî nîne.
Talibê rahê hicazim, ji mixalif hildin,
Bê neva qelbê hezînim, qewata bendî nîne .

Şêrên min ku ceger guşêd minin, der derin,
Dilê Nalî çi reşe, qet xema ferzendê nake.

Dîwana Nalî , rûpelê 64

REWŞA ABÛRÎ Û DEBARA JIYANÊ

Efsan Kurdî

Di hêla abûrî de û li ser asta dewletên erebî Sûrî yekemîn dewlet dihate naskirin,

Lê welatiyên wê qet sûd ji vê abûriyê nedidîtin, û kesekî nizanîbû ka ev qas saman û xêr bi ku ve diçin, lê gelek kes ji gelê sûriyê dibêjin ku tenê rêcîma ku ev welat birêve dibir û hin kesên nêzî wan sûd ji van samanan werdigirtin.

Dewleta sûrî di hemû cûreyên abûrî de dewlamend bû, çi petrol be, an pîşesazî û çandinî be.

Dibe ku devera herî bi xêr û bêr li vî welatî bakurê sûrî ye, ku bi petrol û çandiniya xwe dewlemend e,

lê ji ber ku nişteciyên wê kurd in, rêcîmê bi zagonên xwe nedihişt ku ev dever pêş bikevin û xelkê wê dewlemend bibin, û qet qebûl nedikir ku kargehên mezin li van deveran bêne vekirin û avakirin.

Piştî ku şoreşa sûrîyê destpê kir û şerê çekdarî û navxweyî bi rengekî berfireh li tevahiya erda sûriyê rûda, pê re û hin bi hin abûriya sûriyê jî ber bi wêranbûnê ve diçû, û bi domkirina krîza Sûriyê re binyata aboriyê ya jêrîn bi carekê re wêran bû, û vê yekê bandoreke pir xirab li rewşa welatiyên sûriyê kir.

Li rojavayê kurdistan jî ku ew beşek ji vî welatî ye, kirîza abûrî bandora xwe bi rengekî diyar li rewşa xelkê kir bi taybetî li ser kata karmendên dewletê , ku mûçeyên wan li gorî debarên jiyanê pir hindik e, û têra wan û deh rojan nake.

Û Ji ber ku nirxê lîreya sûrî li hemberî dolar pir erzan dibe, rewşa xelkê ya abûrî her diçe têk diçe.

Derbarê rewşa abûrî û debara jiyanê de, Kovara Welat rapirsînek li bajarê Amûdê amade kir, tê de nêrînên xelkê şopand.

Mamoste Ferîd karmendekî dewletê ye, behsa wê yekê dike ku di van çend salên bûrî de debara jiyanê pir lewaz bûye, her tişt buha ye, li himber wê hîn mûçeyên me wek berê ne, tu zêdebûn nehatiye ser, buhaya tiştan zêde dibe û mûçeyê me wek xwe dimîne, nirxê mehaneya me dora 50 dolarî dike, tenê ev mûçe têra hefteyekê dike ji ber vê yekê rewşa jiyanê pir zehmet e.

Lê tevî vê yekê li herêma me derfetên kar pir in, ji ber ev herêm li ser asta parêzgehên sûrî ya herî ewle ye, lewra debara jiyanê li vir tevî zehmetiyê jî lê ji deverên din baştir e.

Mûsa Ibrahîm welatiyek ji Amûdê ye, dibêje ku debara jiyanê li vê deverê pir zehmet e, yek ji sedemên wê daketina nirxê lîreya sûrî ye, ya din jî buhabûna nirxê mazotê ye, Herweha em tev dizanin ku abûriya deverê xwe dispêre çandiniyê, û îsal piraniya ziviyan şewitîn.

Em dikarin bêjin ku xelkê deverê debara jiyana xwe bi wan pereyên ku zarokên wan ên li derveyî welêt in ji wan re dişînin, û beşek din jî li ser wan mûçeyên ku ji rêveberiya xweser wedigirin jiyan dikin, ku niha bi hezaran karmend di nava rêveberiyê de dixebitin.

Mihemed Şêx welatiyekî Amûdê ye, di rêxisteneke mirovî de ka rdike, ji kovara Welat re axivî û got:

"Tevî rewşa buhabûnê û zehmetiya jiyanê, lê ji ber aramiya vê deverê derfetên kar pir hene, wek karê van rêxistinên mirovî ku li vê deverê kardikin, bi hezarên malbatan sûdê jê wedigirin. netenê kesên ku li nav wan kar dikin, lê bazar tev sûdê ji karê wan dibînin, niha bi dehan xêxistin hene, û bi dehan navendên ragihandinê çêbûne ku xelk di wan de dixebitin.

Ez dikarim bêjim ku ji bilî van hemiyan niha avahiek berfireh li vê deverê destpê kiriye, di gumana min de tu kes bêkar nema ye, bi kurtî ez dikarim bêjim ku li himber buhayiyê pere jî li vê derê pir bûne."

FERHENGOK

derhoze	معجزة
kêmpeyda	نادر
salox	وصف
Pêşbînî	توقع
raz	سر
çêj	طعم-مذاق
henase	نفس
hûrgilî	تفاصيل
damar	شرايين- عروق
garantî	ضمان
Komkujî	ابادة جماعية
Kuştar	مذبحة
garantor	ضامن
têkçûn	هزيمة
sawêr	خيال
binyat	أساس
Pêvajo	مرحلة
rojev	أجندة- أحداث اليوم
çarenûs	مصير
jêder	مصدر

XANÎKA.. MALBATA ŞEHÎDAN

Kovara Welat

Helbet gava ku mijar welatparêzî be, kes nikare li pêş bilindahîya şehîdan xwe bide der. Tekez gava ku mijar şehîd bin, eger pênûs xwe biavêje hemû ferhengên cîhanê, dê ji bo pesindana wan, peyvên layiq peyda neke. Tîpên ku mafê şehîdan xweş bidin wan, di nav tu abeceyan da nahên dîtin. Çimkî kesê ku canê xwe ji gel û welatê xwe ra raber bike, helbet dê zimanên cîhanê têra behsa wî nekin.

Bi destpêka şoreşa Rojavayê Kurdistanê ra , lehengên vî welatî bê dudilî tev li nav refên şoreşê bûn û karwan bi karwan ber bi şehadetê ve ji bo azadîya gelê xwe dane rê. Bi tîpinên zêrîn dîroka gelê kurdistanî bi xêz û pelinên ronîdayî zengîn kirin. Herweha bi saya xwîna xwe jîyaneka birûmet ji gelê xwe ra dabîn kirin. Zêdeyî 11 hezar gul û beybûn ji nav baxên welatê me hatin çinîn. Ew jî bi hêvîya vegera buharê li nav xaka Kurdistanê.

Malbata Xanîka ji wan malbatên yekmîn bû ku xort û xweşmêrên wê tev li şoreşê bûn. Bi mêranîyeka bêhempa, berevanî di ber welatê xwe da kirin. Herweha ji bo pêşeroja Kurdistanê, çend bedew û lehengên xwe pêşkêş kirin. Malbata Xanîka navê xwe ji taxa Xanîka dibe. Taxa Xanîka jî taxeka ji bajarê Qamişloya rojavayê Kurdistanê ye. Malbetek e ku bi welatparêzî û mêranîyê naskirî ye. Ji bo axa Kurdistanê birke ji şehîdan oxir kirine.

Rêzkirina şehîdan li gel agahîyên wan, li gorî dîroka şehadeta wan :

- Idirîs Xanîka. Şehîdê raperîna Qamişlo ya ku di 2004an da li dijî rêjîma Sûriyeyê gur bû.

Dema ku hêzên ewlekarîyê yên Rêjîmê, gule bi ser sivîlan da barandin di encamê da ş. Idrîs li gel şerhîdên serhildanê li ser xaka Qamişlo şehîd xistin û ji wî xeta şehadetê dest pê kir.

-Nav û paşnav: Umer Ehmed (Umer Xanîka)

Navê dê: Siltana

Navê bav: Nûredîn

Cih û dîroka jidayikbûnê: Qamişlo, 1995

Cih û dîroka şehadetê: Kobanê, Meştenûr 4.10.2014

Umer ji destpêka şoreşê ve tev li refên wê bû. Umer bi nasnavê Fermandarê Biçûk dihat nasîn. Dema operasîyona rêxistina Daişê ya terorîst li dijî bajarê Kobanê û tevî ku rê ji Qamişlo ber bi Kobanê ve girtî bû, Umer Xanîka bêdeng nema. Bi qaçaxî ji Binxetê derbasî Nisêbîna Serxetê bû û ji wir berê xwe da Sirûcê, da ku careka din ber bi Kobanê ve binxet bibe. Bi biryar dixwest navê xwe di destana Kobanê da tomar bike.

Di 25ê rezbera 2014an da birîndar bû û di 4.10.2019 da di encama birîna xwe da şehîd bû.

Nav û paşnav: Mihemed Yasir Ehmed (Yasir Xanîka)

Navê dê: Fatima

Navê bav: Îsa

Cih û dîroka jidayikbûnê: Qamişlo 4.4.1984

Cih û dîroka şehadetê: Hesekê, gundê Ebdê 26.7.2015

Yasir Xanîka ji yekemîn tevlîdarên hêzên Yekîneyên Parastina Gel bû. Di şerê Serê Kanîyê da beşdar bû. Piştî şehdeta birazîyê wî ş. Umer Xanîka, tabûrek bi navê wî di nava hêzên YPGê da ava kir û bû tabûrqomîtanê wê. Tabûr tev li hemû enîyên şer ên li dijî Daişê bû. Di encama siwareyeka bombekirî da li gel çend hevalên xwe li Hesekê, gundê Ebdê

şehîd bû. Ş. Yasir Xanîka bavê du zarokan bû, Şêra û Laşer.

- Nav û paşnav: Mihemed Mûnîr (Aras Xanîka)

Navê dê: Fatima

Navê bav: Hec Mûnîr

Cih û dîroka jidayikbûnê: Qamişlo 1985

Cih û dîroka şehadetê: Hesekê, gundê Ebdê 26.7.2015

Yek ji şervanên pêşîn yên ku tev li refên şoreşê bû. Ji şerê destpêkê li Serê Kanîyê û ta dîroka şehadeta xwe di 26.7.2015 da li gel ş. Yasir, di hemû operasîyonên li dijî Daişê da beşdar bû. Berevanîyeka bêsînor di ber gelê xwe da kir.

Hêja ye zanînê ku weke xelatekê ji keda wan ra û da ku navê wan her di nav gelî da bimîne; du qad li bajarê Qamişlo bi navê ş. Yasir û ş. Aras hatine binavkir in.

-Nav û paşnav: Mihemed Suheyb Ehmed (Cesûr Xanîka)

Navê dê: Lînda

Navê bav: Xalib

Cih û dîroka jidayikbûnê: Qamişlo 2.12.1991

Cih û dîroka şehadetê: Qamişlo 20.4.2016

Piştî ku ji artêşa rêjîma Sûrîyeyê veqetîya, tev li nav refên şoreşa rûmetê bû. Bi hevalên xwe ra gelek pêngav li dijî rêxistina Daişê ya terorîst li dar xistin. Di encama şerê li dijî rêjîmê da li Qamişlo di 20.4.2016 da şehîd bû.

-Nav û paşnav: Faris Hesen (Faris Xanî)

Navê dê: Zubeyda

Navê bav: Evdilhemîd Elî

Cih û dîroka jidayikbûnê: Tirbespîyê 1979

Dîroka tevlîbûnê: 2012

Cih û dîroka şehadetê: Til Hemîs 30.8.2016

Ş. faris weke hemû lehengên malbata Xanîka ji destpêka şoreşê ve tev lê bû. Li dijî hemû hêzên tarîtîyê û ji bo gelê rojavayê Kurdistanê berxwedanîyeka mezin nîşan da. Di 30.8.2016 da li Til Hemîsê gihaşte dawîya rêwîtîya xwe û şehîd bû. Ş. Faris zarokek li pey xwe hişt.

Keçika deh salî Eyşe jî da li ser şopa lehengên malbata xwe û di encama guleyeka bêserûber da roja duyan ji Cejna Qurbanê jiyana xwe ji dest da. Eyşe Mihemed a ku di 13.6.2009 da ji dayîk bûbû, di 22yê heman mehê da sala 2018an û ji ber berdana guleyan a bêserûber, mîna firîşteyekê ber bi esmanan ve firîya .

Hêjayî gotinê ye ku gelê kurd li rojavayê Kurdistanê, ji destpêka şoreşa sûriyê û kirîza wê ve, ji bo parastina deverên xwe û ji bo jiyaneke azad û bi rûmet, herweha di şerê li dijî terora Daişê de, di ber hebûna xwe de û di ber mirovahiyê de bi hezaran şehîd û qurbanî da.

Agahî bi saya m. Kefa, hevjîna ş. Yasir Xanîka; dayîka Şêra û Laşer hatine bidestxistin

ÇAR HELBESTÊN

«ÎMAD EBÛ SALIH»

Werger ji erebî: Imran Yûsiv

Di xew de bû dema şoreş li dar ket

Razayî
Di xew de bû.. dema şoreş li dar ket
Ji nav cihê xwe ranebû,
tevî ku dengê sloganan
di pencereya odeya xwe re dibhîst.
Xeweke giran dikir,
tenê li mal bû
li tevahiya taxê,
ne xirecira froşkaran,
ne qêrîna zarokan,
û ne jî reyandina segan.
Tenê bû...azad bû
dema ku şoreşgeran
cendekê azadiyê bi oxir dikir.

Pîremêr
Li qorçîkekê xwe li hev pêça bû.
Pêxwas..û cil rizyayî,
Xwîn ji devê wî diherikî,
Pîremêrekî hezhizî,
Ku nikarîbû derkeve destavê,
Şoreşê ew bi xwe re bir,
û li vir avêt
da ku ji neçarî bibe şoreşger

Tekoşer
Li ber cêba leşkeran
ya ku gelê bihêrs agir pê xistibû
rawestiya.
Heman cêb e
ya ku destgirêdayî
lê hatibû siwarkirin
gava hîn ew ciwan bû
Ji zû de Bendewarê vê kêliyê bû
Lê dema ku hat
hest bi şanaziyê nekir
li xwe matmayî ma
hêdî hêdî
xemgîniyekê xwe berdida hinava wî
tevahiya laşê wî girt
Li hember xwesteka vemirandina pêtên agir
ên ku buhatirîn bîranînên wî dixwarin
li ber xwe dida

Derbider
Ji zaroktiya xwe ve
Derbider dijî
Ne mirov
Ne kar
Ne hêvî
Ji kêfa firiya
dema ku meydan tijî şoreşger bû

Îmad Ebû Salih: *Helbestvanekî Mesrî ye, helbesta bexşane dinivîse, li bajarê Mensûra li bakurî Mesrê sala 1967an ji dayik bûye.*



غدر الليالي

شهناز يوسف

كثرت ليال الغدر
أيامه،
كثرت سيوفه المسمومة
وغاب نبض الضمائر
وكان ما كان.....
اتخذوا من الفجر ستاراً ،
من التكبير نشيداً
وشحذوا الهمم
من الغدر اسلوباً ،
ومن الغافلين والأبرياء فريسة ،
أي سم كان يجري في خلاياهم؟
وبأي غلٍ ينبض الفكر....؟!
لا أدري لماذا تغفو الانسانية
عندما يقتل الكوردي
وتنتفض من رقادها عندما يولد له
طفل صغير.....؟!
في كوباني ،
لم يقتل طفل أو شيخ
أو امراة.....
في كوباني ،لم يهدم بيت أوحارة،
مشفى أو مدرسة أو سوق،
في كوباني للحياة قطعت
كل الشرايين....
كوباني قتلت ذات مرة
وعفرين تحتضر ألف مرة
وأنتم يا بني قومي
مشتتون تائهون
والعقول أصابها الخدر
قد ضاعت منكم الفطنة
والعبرة ضاعت
مرة ومرة
ومرة.....

توزع مجـــــــاناً

"Rastî xwedawendê mirovê azad e"

Koma "Serdem"

şanoya "Venasîn"

pêşkêş kir

welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat
ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة
العدد (٦٧) ٢٠١٩/١٠/١ م